



Bernameya sexbêriya zarokan û demvalahiyê

KURMANJI

Bernameya sexbêriya zarokan û demvalahiyê bernamêyeka pîşeyî ye û bidestxistina dîplomêya pîşeyî armanca wê ye.

Bernameya sexbêriya zarokan û demvalahiyê ji te re ye yê ku hez dike li gel zarok, ciwan û mezinan kar bike. Tu dê zanyariyan li ser mirovên ku di temenên cuda de ne û bi şertên cuda ne werbigirî.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pîşeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursan bixwîni da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomîni.

SÊ PISPORIYÊN CUDA

Czas wolny i zdrowie

- Tu dê zanyariyan li ser demvalahî, tenduristî û sihetparêziyê werbigirî. Ev pîsporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, karmend li saziyên avjeniyê/ salonên sporê, karmend li saziyên werziş û demvalahiyê yan rahênerê/ antrenorê şexsî kar bikî.

Karê perwerdeyî

- Tu dê zanyariyan li ser fêrbûn û mezinbûna zarok û ciwanan werbigirî. Ev pîsporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, sexbêrkarê zarokan yan alîkarê şagirdan kar bikî.

Karê civakî

- Tu dê fêr dibî ka tu dê di rewşên cuda de çawa pêşwaziya mirovan bikî û çawa piştgirî û xizmeta baş pêşkêş bikî. Ev pîsporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, nobedar, alîkarê şexsî yan piştgir û xizmetkar di warê seqetiyên de kar bikî.

Tiştên ku tu di vê bernamêyê de fêr dibî

Tu dê zanyariyan li ser fêrbûn û mezinbûna mirovan, hevkarî û danûstandinê werbigirî. Tu dê xwe hîn bikî ku miameleyê bi mirovên din re bikî û şiyana xwe pêşde bibî ku guhdariya pêdviyên wan bikî. Tu dê bikarî hizir bikî ka mirov çawa bi hev re dijîn û îmkane wan yê pêşdeçûnê çî ne. Tu dê zanyariyan li ser tenduristî û jîngeha karî werbigirî.

Di vê bernamêyê de, giringiyeka mezin li ser qaîdeyên exalqî, nîrxên demokrasî û mafên mirovî ye.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameyên pîşeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernameyên pîşeyî de, tu dê zêdetir madeyên pîşeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî.

Madeyên taybetmend yê hevbeş yê bernameyan ev in: tenduristî, zanist, perwerdekarî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bername-kûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Bername li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî ava dibe. Tu dê şiyana xwe ya înisyatîfgirtinê û behremendbûnê xurt bikî, û zanyariyên zêdetir li ser îmkanên birêvebirina şirketeka şexsî werbigirî. Tu dê xwe hînî plankirin, pêkanîn û dokumentkirina karî bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya sexbêriya zarokan û demvalahiyê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihek yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecribeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihek yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bername-kûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew kurseka zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî ye. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.